

Jimare  
3  
1987



Mîrkutên xwe bilind kin 1

# MÎRKUT

KOVARA HER TIŞTÎ YE JI BO HER KESİ YE



RAMBO: "PIŞTÎ AFGANISTANÊ

EZÊ WERIM KURDISTANÊ"



# mirkut میر کوت

Kovara Kurdî a Mîzahî

گوّفا ریکی کالتھو گەپی کوردى يه

Humoristisk Kurdisk  
Tidning

Journal Humoristique  
Kurde

خاوهن و بهرپرسیار :

ansvarig utgivare  
och redaktör:

Mahmûd LEWENDI

Adress :  
Post Box: 24012  
750 24 Uppsala  
SWEDEN

Prix: 10 SKr/10 FF/2 DM

Tarîxa çapê: 1.01.1987

Merheba

Em ji dizanîn ku em bi  
derengî ketine !

Divê def meh berê  
hatiba derxistin, lê em  
çî bikin, qavê tunebûnê  
birje !

Ger we ji tunebûn dîtibe  
wê qavê hunê sam bikin  
ku ji bo çî em bi derengî  
ketine.

Lê, dîsa ji bibexşînin.

MÎRKUT

# ÇEND GOTIN

Ev e jimare 3 jî derket, heta jimare 4 xwe  
dê mezin e.

Jimareya pêşîn ji kîsi me çû!

Jimare 2 jî, me 1200 heb çap kir, jê 800  
heb hat fitotin, lê perê 100 hebî gehîst des-  
tê me, 'ecêb e wellah ul-'ezîm !

Kovara Federasyona Komelên Kurd li Swêd;  
Berbang'ê(di jimare 7/85'an de)dîsa bela xwe  
di me daye, ci ye efendim, navê Mîrkutxelet  
hatiye nivîsandin, bi ya wan divê ne Mîrkut  
lê "Mîkut" an jî "Mêkut" be. Dîsa di jimare  
2 ya Mîrkut'ê de me rexneyek li Berbangê gir-  
tibû, çimkî hegaret li kovara me kiribûn, li  
şûna ku bigotana "kovara mîzahî", gotibûn "ko-  
vara qerfan". Li ser vê yekê em jî hinekî qehe  
rîbûn û me rexneyek li wan girtibû. İcar wan  
jî goya rexne li rexna me girtine, û hinekî  
jî bi ser ve kirine. Lê nivîsek welê ecêb ni-  
vîsine ku cewto-mewto û xwaro-maroye, ser û  
binê nivîse li hev geryaye, ji ber wê jî me  
tu tiştîk ji wê rexna(!) wan fam nekir ku ber  
siva wan bidin.

Tîştîkî din jî, me bihîst ku serokê Enstî-  
tuya Almanyayê ji me qeherîye, yanê bi gotine  
ke din tûre bûye. Çimkî me di hejmara berê de  
rexne li kitêba Thomas Bois girtibû ku serokê  
vê Enstituyê Y.Geylanî jî navê xwe li ser ki-  
têbê nivîsibû.

Ji alî ekonomîyê de jî rewşa me ne wekî be  
rê ye, lê jê xerabtir e. Li derveyî 7 kesan tû  
kesî alîkarîya me nekir. Ew kes jî ev in:

Ali Bucak (Paris).....500 Frank  
Bekir Şahîn (Sydney).....306 Kron  
Lutfî Baksî (Stockholm).....200 Kron  
Malmisanij (Stockholm).....500 Kron  
M.Emin Bozarslan (Stockholm) .. 50 Kron  
Nûrî (Paris)..... 90 Frank  
Nûreddîn Zaza (Lozan)..... 70 Frank  
Restaurant Dîlan (Parîs) .....250 Frank

Icar ci şansekî xerab ! Gava ku xwedê li  
ev neyne xerabtir jî dibe. Heval Bekir Şahîn  
306 Kronê xwe li ser navê me yê maxlas (naznav)  
sandîye ku wê jî em nikarin ji bankê bikşînin.

Heval Reşoyê Qerejdaxî jî divê bibexşîne  
ku me nikarîbû cîh bida nivîsa wî ya bi navê  
"Serzullût". Nivîsek hêja ye, lê ma xwedê jê  
razîbiyo 12 rûpel nivîsiye, ji xwe kovara me  
çend rûpel e!!!

Tîştekî din jî, divê hun li qusûrê me nenê  
rin, ji ber ku me ev hejmar 8 meh berê hazir  
kiribû, lê fersend û mecal û imkana me ya çap  
kirinê tunebû ku me çap bikira, ji ber wê ye-  
kê jî mumkune ku hin nivîs aktualîta xwe win-  
da kiribe.

De bimînin di xwesîyê de  
Ger we perê xwe da mala we ava!

MÎRKUT


MÎRKUT



BELAV DIBE!

Belê, Mîrkut belav dibe(neku ji hev de dikeve û perçê dibe), nav û dengê Mîrkutê ji Amerika ta Awîstralyayê, ji Antartîka ta Afrikayê, li her derê dunyê belav bû û dibe.

Ji reşikên Afrîkayî bigrin ta bi gun-diyyêñ Kercewê dexî, êdî hemû xwedan Mîrkut in, Mîrkutêñ wan di destê wan de her têdikut.. pardon, têdikoşin.



# NAMEYEK JI ŞAM'Ê

Rifaqêن me yên ezîz di mucella MÎRKUT de.

Bi sereha ez gelekî besitîm ku min mucella we xwend. Lî ennehu wexta ku mucelleyeke fukahî bi zimanê kur-dî izdar dibe y'anî tetewirek melhûz di tarîxa sefahat el-kurdî de tê încaz kirin.

Ez bi xwe şexsen kitîr temennî dikim ku hûn her daîm û kul yewm iştîmrar bikin.

Museqgefekî Kurd-Wetenî  
-ŞAM/DIMISQ-

**BERSÎVÛHA:** Yanê bersiva me

Heval el-xoşewist

Yûdil geşûna ennû bersivûke, 'ela gotinûkatûke el-bâheyat w'el-giranat el-ku nayêن hilgirtin w'el-nayêن daqurtandin.

Çimkî nametûke ket fi destûna, fekul xwendevanûna têdinegehiştûna. Fe ennû daxwazû minke en tu were m'ea nametûke fi caretên din, yan jî hîn bibe zimanûke.

El Beşet ul- Vegerandin  
Fi Kovaret el-MÎRKUT



(pendî pêşinan)

## Gotinê bav û kala

HETA MIRINÊ  
ÇAV LI KIRINÊ.

KESO KESO  
CAREK BESO

XEMA KOR E  
MÛM BUHA YE

HETA GENIM FIRÎK E,  
MELLE ŞIRÎK E

KEVIRÊ HAVİNÊ,  
BAVÊJE KULİNÊ

BILA HINDIK BE,  
BILA RINDIK BE

BUHARÊ – PEZ  
PAYIZÊ – REZ  
ZIVISTANÊ – EZ

EZ AXA, TU AXA,  
KÊ GOLIKA BIBE  
NAV BAXA ?

# KIN KURT

dengÜbas



## STOCKHOLM

Paksî ji Amerîkayê vegerya û yekser çû Awisztralyayê û nuha jî li İspanyayê ye.

M.B. ewê îsal jî di balkona xwe de baxdenos, turp û pîvazan biçîne.

Li gor gotina Paksî, xelkê ew kiriye endamê PEN-KLUB'ê, içar tişteki ecêb Heme Üzin jî endamê wê Qûlibê ye.

## BONN

Dr. Yekta li Almanyayê xwe kir serokê Enstîtu yê.

## PARÎS

Serokê Enstítuya Parîsê jî Kendal e.

## JI DUNYE

Çareya AIDS'ê hat dîtin:îsot

Ruhayî bi saya serê îsotê ji AIDS'ê filitîne.

Mîrkut derket.



Xumeynî bi AIDS'ê ket.

Seddam neket.

Xwedê mezin e.

Ezê jî herim Amerîkayê û piştre Antartîkayê.

- Te got çi ?
  - Min ?:
  - Erê te.
  - Min got çi ?
  - Erê te çi got ?
  - Min tiştek negot.
  - Lawê segan, te got.
  - Kurê kûçikan, welle min negot.
  - Dolê kotiyan, ez dizanim, te got.
  - Min negot.
  - Te got.
  - Kurê qahpê, min got û zêde!
  - Teq, tûûûjjj.
  - Teq, teq, ...
  - Gummeeeeeee!
  - Axxxx bavo, ...
  - Axxxx yadê, ....
  - Hawasar, kurê meyê wek şêr, bi destê kuçikan hat kuştin, ...
  - Hahooo, lawê meyê egîd bi destê rûviyan hat kuştin, ....
- ÇIROK HÎNA JÎ BERDEWAM E, ... Kî dibêje em ne  
mêr in?!**



## beytek

**NE SING Ü NE SEWAN E  
REPE REPA MÎRKUTAN E I**



Melle Mirkut

# qisê qorr!

NIVÍSKARÊ wê : Ez

Çend roj berê ez li kafeyekê(café) rûniştibûm.  
Garsonê kafeyê hat ba min û got:

-Çi dixwazî ?

Min got:

-Qahweyekê ji kerema xwe re.

Garson qahweya min anî danî ber min. Wekî her gav min pêşî cixareyek derxist û vêxist. Di pê re min se kir avêt qahwê, dawyê min bi kevçî hêdî hêdî li hev xist. Şekir û qahwe baş li hev geryan şûn de, min hilmek din jî ji cixara xwe kîsand. Lê ev hilma ne wek hilma her wextî bû, hilmek welê bû ku dûman heta binê pişika(cîgera) min a sipî çû, li jêr zemînî cî gera min ket û têde fetili. Di hemûyê fetlanokên cî gera min de gerya û ruyê xwe da berbi jorê, hat nêzî kî qirikê, di wir re jî di bin zimanê biçük re hat na va devê min, li ezmanê devê min ket û di nava devê min de hinekî gerya. Li qulukekê, li riyekê digeriya ku çawa bike derkeve der. Xwe nêzî ber diranan kir, di ber diranan re xwe şemitand hat ket nabêna diran û lêvan, li wê derê jî xwe hinekî gevizand û di pêre xwe li bin çengê pidîyan xist û di nava her du lêvan re derket der...!

Belê, a wê gavê, ango di pê vê bûyera dûmana ci-xarê re, divîya ku qultek qahwe bihata vexwarin.

Wele hema min hêdîka destê xwe yê rastê dirêjî qulpa fîncana qahwê kir. Min hêdî hêdî fîncana qahwê rakir berbi devê xwe bir. Lêv ji ber xwe ve ji hev vebûn, wek erdekî ku qet gîsin lêneketibe û li hêvîyê be. Üfîncana qahwê pêre pêre xwe nêzî lêvan di kir. Gehîştin hev. Devê fîncana qahwê devê xwe da ser lêva jêrîn, lêva jêrîn di wê gavê de wekî ku ji nû ve biafire vejîya....

U di nava dev de tevgerek, diran ji alîkî de, ji alîkî de jî ziman, pidî, ezmanê dêv û zimanê biçûk, hemû bi xwe ve hesyan, bi xwe ve hatin, di hemûyan de tevgerek, lebatek, te digo qey hemû ji do de li hêvî yê bûn...

U gava ku fîncana qahwê hat ser lêvan, qahweya di hundurê fîncanê de êdî ber xwe nedî, her wekî korekî ku di çalekê werbe; wî jî hema xwe di ser lêva jêrîn re xuşikand hundur. Lêv ji zewqa xwexuşikandina qahwê ji xwe ve çûbû, mest bûbû. Temamê lebatêni di dêv de ji nû ve vejiyabûn. Lê qahwe li wê derê pir nesekinî, hêdîka xwe li bin çengê zimanê biçûk xist û di wir re xwe berra qirikê da. Qirik ji do de li hêviyê bû, lê qahwe nedisekinî, wî xwe di wir re îcar berra hûr da, û di hûr de gerya, gerya, gerya û gerya ta ku mest bû, di qucikekî hûr de pal da.....

U wele hema min destê xwe dirêjî xwelîdankê kir ku cixara min li ser bû, min cixara xwe girt û min hilmek din jî jê kisand.....

-OEDY A-

**NOT:** Ev kurteromana me her heqqê wê mehfûz e, tu kes nikare bê tñâ me bidize. Zati yê ku bixaze jt nikare bidize, ji ber ku nivîskarê vê romanê hñ nemirîye, li heyatê ye. Ger wek nivîskarên Hawar û Ronahîyê miribana dîsa neyse.....

HINDIK-RINDIK

Tiştê xwes xwes e.

Nan Ø mast xwarina rast,  
Nan Ø dew xwarina derew.


Ariya ber tifika xwe,  
Nadim bi birinca xelkê !

Wa dezanê ke zor dezanê  
Nazanê ke hîc nazanê !

Aş çû,  
emê li çeqçeqokê bipirsin


Apê Xidiro,  
Herro diro li viro !

Agir bi mala yekî ketibû  
Yê din jî ser û pê li, ber



ترك بيتن «يوروم يوك»

foto: Rob Huibers / 1984



# BAJARÊ BISMILEYE GÎDIPSEEEN?

Li hêla Bismilê, ji gundê Koseliyê  
merivek ewê biçe bajêr.

Jina wî jê re dibêje:

-Ma bajarê Bismileye gîdipseeen,  
Fatoşeye bir don getiiir.

Mêrik:

-Ne bilim ne qederdiiir!

Jinik:

-Hema bir mitro bir nîgine  
Bir mitro jî dîger nîgine,  
Elli santîm nav nîgine  
Girmî bêş santîm jî pizîsine  
getir, bestir.



Kemal/Bismil

## BANGEK !

Jibo redaksiyona Mîrkut, em li kurdeki  
digerin ku dîvê qet helbest(şîir) nenivî-  
sandibe û dîsa divê di demêñ dahatû de jî  
nenivîse.

Sekreterê Kar û Barê Mîrkut





Piştî hevdîtin û axaftinên dûr û dirêj, Rambo hate iqna kirin ku were Kurdistanê.

Ev bû ses meh e ku heyeta jibo iqnakirina Rambo çûbû Amerikayê, bi tonek bertîl û ruşwetan ancax xwe gihadine Rambo.

Di pê munaqeşeyek dûr û dirêj re Heyeta me Rambo iqna dike ku were Kurdistanê, fîlimekê li ser kurdan çêke.

Li ser vê yekê Redak-siyona Mîrkut derhalkê civînek çêkir. Civîna me 5 deqqe ajot, tenê birya rek hate girtin; ew jî: 'el el-'ecele şandina muxbireki Mîrkut bo Holl-ywood'ê. Ü wele hema me hemûyan çî pere di bêrîka me de hebû, me gişk da vi muxbîrê xwe û me bîlêta tiyarê jî jê re kiri û me bi rê kir şand Amerikayê 'jibo' dîtina

Rambo û Heyeta Kurd. Nuka em li jêrê xeberên ku muxbirê me bi teleksê ji me re şandiye pêşkêsi we dikan:

" Min Rambo dît. Rambo hatiye iqna kirin, ewê were Kurdistanê, lê ne îsal, ji ber ku îsal ew dê biçe li Afganîstanê fîlimekê çêke, û di vê fîlimê de (fîlim îcabî) ewê Afganîstanê ji bin destê Rûsan xelaske. Di pê re(yanê di fîlima du doyan de) îcar ewê were



Kurdistanê. Ewê Kurdistanê jî ji bin destê Rûsan xelaske."

### Sertê RAMBO

Sertê Rambo gelek in ji wan yek jî ew e ku hemû kurd qebûl bikin ku Kurdistan 5 perçê ye. Li gor Rambo heta nuka tenê 4 perçên Kurdistanê diha tin zanîn, lê Rambo perçê pêncan jî kifş kiriye Li gor wî perçê pêncan di bin destê Rûsan de ye

Li ser vê yekê muxbirê me jê pirsiye:

-Ma çawa dibe?

Rambo:

-Belê, ev rastiyek e û berî her tistî divê ku kurd vê yekê qebûl bikin ku Kurdistan 5 perçê ye. Yanê Kurdistana Tirkîyê, ya Sûriyê, ya Iraqê, ya Iranê û Kurdistana Rûs-yayê, ku perçê herî mezin jî ew e. Ma hun get

rojname û kovaran naxwînin ? Hemû dinivîsin ku ji Ermenîstanê bigre he- ta bi Qazakîstan û Azer- beycanê kurd hene. Ji vê jî tê fam kirin ku perçê herî mezin di bin destê



Rûsan de ye. Ev filima min jî bi taybetî ewê li ser vî perçeyî be, yanê Kurdistana Rûsyayê. Di vê filimê de ezê Kurdistana Rûsyayê ji bin destê rûsan xelaskim.

(dumahîka vê nivîsarê emê di hejmara dahatû de belavbikin. Mîrkut)

## STUDIA KURDICA JÎ DERKET !

Axirê li dawiya dawî- yê STUDIA KURDICA' jî der ket.

Di dawiya 1983'an de nivîs civandin.

Di destpêka 1984'an de nivîsên civandî daktîlo kirin.

Di dawiya 1984'an de mîzanpaja wê çekirin.

Di destpêka 1985'an de jibo çapê birin matbaayê.

Di dawiya 1985'an de ji matbaaye derket.

Di destpêka 1986'an de jî, ji me xwendevanan re şandin, û ewê di dawiya 198 'an de jî bigehîje destê me. Her çendî ge- hiştîye destê hin kesan, lê ew torpîlli ne!

---

(\*) STUDIA KURDICA kovara Enstituya Kurdi ya Parî- sê ye ku bi tirkî derdi- keve, her weha farisi û erobiya wê jî heye.



## çend peyvîkên nû

Dr.Zimandirêj DEVJIHEVE

**Homokutîzm: Homoseksualizm(..)**

**Homokut/Piyawkut : Homoseksuel.**

**Rexnegirtin : Tenkîd kirineki normal**

**Rêxgirtin : Tenkîd kirineki anormal**

**Rexnelixwegirtin : Rexneyekî pozitif e**

**Rêxlixwegirtin : Rexneyekî negatif e**

**Rêxliyekîgirtin : Rexneyekî negatif e.**

---

(..):Li gor Dr. Bijişk, nexweşıya AIDS'ê ji  
Homokutizmê tê.

### du anons

Emrê min 76 e. Bejna min 180cm. ye. Giraniya min 80 kilo ye. Ez ji gundek Bismilê me û ji Kurdistanê nû hatime. Li hevalika porzer digerim, ku emrê wê ne di ser 15'an re be. Bejna wê kêmî 175cm nîn be, û ji 50 Kg yê zêdetir nîn be. Divê bi ajnê zanibe û ji Bet hoven jî hez bike, yan na nabe.

"Porzeram"



Göteborg SWED

Ez jinebî me. Emrê min 21 e. Diya 2 zaroka me. Ji tiyatroyê, ji dansê, ji müzîka klasîk û ji sohbeta li ser roman û fîliman hez dikim.

Muptelayê alkolê nînim lê li ber şîvê ji du îşkan şeraba sorî fransiz re jî nabêm na.

Tu, mîrê ser nerm ku we kî min dikare şîvê çêke, fîraqa bişo, potikê zaro kan biguhere û nav malê bide hev, li te digerim!

"Di Evînê De Wekhevî"  
HEKKARI

# NAVÊN KURDÎ

Jibo zarokêñ we yêñ nûçêbûyî  
an jî yêñ li rê ne.

Agirkut	Hemekut	Nekut
Bakut	Hemokut	Nîvçekut
Bankut	Holkut	Pirkut
Békut	Homokut	Piyawkut
Bêrikut	Jinkut	Pozkut
Bikut	Jankut	Paşkut
Binkut	Jêrkut	Pêşkut
Cîkut	Jorkut	Rêkut
Cunnîkut	Kerkut	Rotkut
Çakut	Keskut	Serkut
Dankut	Kêmkut	Sîrkut
Darkut	Liberkut	Singkut
Derkut	Libinkut	Tamkut
Elokut	Lihêfkut	Xanîkut
Erdkut	Liserkut	Zikkut
Hûrkut	MÎRKUT (x)	Zûkut
Herkut	Malkut	

(x): Dîqqeet!!!

Mîrkut, her heqê wê meñfûz e. Tu kes  
nikare bêmusa'deya Mîrkutê navê Mîrkut  
li zarokêñ xwe ke.

Dîvê her kes vê yekê zanibe :

**HER BABET  
BELAVOK, NAME  
Û MESAJÊN HAZIR  
TÊN FIROTIN !**

**\*name**

- Nameyêñ evînê
- Nameyêñ serxweşiyê
- Nameyêñ eskera
- Nameyêñ pîrozbayîyê
- Nameyêñ ji bo Enstituyê

-Mesajên bi slogan:

5 Wereqe

-Mesajên îsotîn :

100 Wereqe

**\*mesaj**

- Mesajên Şevêñ Newrozê
- Mesajên Kongra
- Mesajên polîtburo
- Mesajên licna merkezi

-Mesajên bi sipas

û silav:10 Wereqe

-Mesajên hingivîn :

50 Wereqe

**\*belavok**

- Belavokên Newrozê
- Belavokên 1'ê Gulanê
- Belavokên li ser Rojhilatanavin
- Belavokên li ser Kolonyalizmê

## Fiyeta belavokan li gor naverokê tê guhertin:

- Belavokên bi rexne: 12 Werek
- Belavokên bê rexne: 6 Werek
- Belavokên li Dunyê dûrim, Li Rojhilatanavîn dûrim,  
û li Kurdistanê dûrim: 20 Werek
- Belavokên damezrandin û hilweşandina komele û kovaran:  
50 Werek
- Belavokên damezrandin û hilweşandina rêxistin û partîyan:
- Belavoka "ÇIMA VEQETYAM" 25 Quriş 100 Werek

## Nimûneyek ji qalibên belavokên me:

### NEWROZ PİROZ BE (1)

Her ku diçe Emperyalîzma Dunyê bi pêşevaniya Amerika û dewletên din yên emperyalîst girtir, hartir, û çavsortir dibe.

Emperyalîzm sistema kapitalîzma monopolîsta heri bilind e. Xurt e, heta qirikê çekdar e, lê ro bi ro qelstir dibe û nuha jî di doşeka mirinê de ye.

Li Rojhilatanavîn tu tiştek wekî berê nîne.

Her tişt tê guhertin. Wilo biley tê guhertin ku ro jek wekî ya din, seetek wekî ya din, deqeyek wekî ya din nîne. Helbet sedemê wê jî emperyalîzma dunyê ye.

Wekî hun jî dizanin divê hemû sinifên karker û gelên bindest û pêşverû û welatparêz û pêşketinxwaz, û anti emperyalîst û anti faşist û anti şovenîst hemû piştgiriya hev bikin û yek bin. Yan na emperyalîzm her çiqas li ber sekratê be jî, zû bi zû namire. Ji ber ku wek her tiştê wê sekrata wê jî dirêj e.

Li Latin Amerika jî rewş kêm-zêde wekî li Rojhela tanavîn e.

Li Afganîstanê jixwe hun dizanin ci dibe. Li Hîndûçinê her wisa. Li Afrîka Başûr dîsa wisa. Şerê İran û Iraqê her wisa dîsa. (2)

Îcar li Kurdistanê jî, ji Meda û vir de çavşoran û weledên wanêن iroyîn û rejîmên wan, tiştê nemayı bise rê me de anîne. Lî nikaribûne dengê me bibirin.

Kolonyalîzm li welatê me ketîye her derê, lewre di vê her kes vê yekê zanibe. Do çawa bû, iro jî wisaye û dijminê me sibê jî me li hember xwe dibîne.

Li Kurdistanê iro pergala berhemîya nîv-feodal, nîv-kapîtalîst û nîv-eşîri hakim e. Pêwendiyêن berhe miyê jî her wilo ne. Avayîya ser û bin divê ji binve bête serûbin kirin. Û divê neyê ji bir kirin ku têko şîna birayêن me yê Filistinî jî a me ye.

Xelasî nêz e. Emperyalîzm û xulamên wê yê kolonyalîst û hwd li ber mirinê ne.

Bibelqite Emperyalîzm!

Bibelqite Faşîzm û zordestiya li ser jin û zarokan!

Bijî NEWROZ ! (3)

(4).....

(1): Alternatifîn din:

Bijî Newroz

Newroz hat

Newrozek din jî hat

Newroz dîsa hat

Me Newroz pîroz kir

Me Newroz bi hev re pîroz kir.

(2): Navên welatan li gor daxwazan têñ guhertin, kêm û zêdekîrin

(3): Silogan li gor daxwazê pirr erzan tê dagirtin.

(4): Navê rêxistinê ji alîyê xwedîyê belavokê ve tê dagirtin.

Erzûhal-Holding

Namenûs Belavokzade Xan, No: 99/z

Telf: 009933-44

DERVEYİ WELAT

## XEBEREK TEZE

Z. Xamoyan,

R. Zilyan,

D. Kotyan,

M. Dirêjyan û

M. Boksîyan li gel S. Perwerîyan û çend kesiyen ji bo tezekirin û nûkirina zimanê kurdi çûn ispanyayê...

Ji ber wê yekê rica me ji we hemû kurden ewe , ta ku van hevalana biryarekê bigrin û vegerin divê tu kes bi kurdi nenivîse û qise neke...Çimkî ewe qerarê bidin ku êdî emê cewa qise bikin...



Komîta ispanyayê di keftûleftê de.

Ji ispanyayê muxbirê me Hecî Mirkutyan

S.O.S.

IMDAAAT!

HAWAREEE !

ME TEHDÎT DIKIN !

*ji aliki de PAKSî*

*ji aliki de jî ZIKTA LEYLANî*

*me tehdît dikin !!*

*Lê, emê ji yeka xwe neyên xwarê !*

MIRKUT



ZOZO

QEDYAN,

DOR HAT

LOLOYA !!

## Sofî Lawo



Wextê şerdê Sêx Seîdi di, yew merdim nameyê ci Sofî Lawo bî. Yew tifingî cêw çaqmaqlı bî.

Aw zeman teyare amey bî, Gêlî(Egil) sera vi-retêni. Sofî Lawo tifingê xwi gêno, teyare ra nano. Tifingê cê dest di parça parça beno. Sofî Lawo wano qey lengera berdê teyara vista û wano: -Vazdêne, mi lengera berdê teyara niya, teyara zî Keramordik(..) di kewta !

Ewra di yew wano:

-Sofî Lawo, aya lengera berdê teyara niya, aw tifingê to yo, to dest di parça biyo!

(..):Keramordik:Nizdiyê Gêlî di yew ca yo.

Xalê NÛRÎ



## KÎ ZANE ?

Weki herkes dizane ku li Swêdê kurdê herî mensûr PAKSI ye.

Gelo li Almanya û Fransayê kî ne ?


# ÇARTINEK

Ez ne di koxa bavê kesî de mirîşk  
Ne jî di bin mirîşka kesî de hêk im,  
Tu kes nikare min bimirişkîne  
Ji sedsalan û vir de ye her dîk im !

Navê Şair di  
arsiva me de vesartîye  
ger pêwist be em di-  
karin rojekê ji we re  
navê wî jî binivisin.

## PÊKENÎNEK

LE  
JINEKEY  
NATIRSE



Yekêk be hawrêkanî delê:  
-Ewî le jinekey detirsê hestête ser piyan!  
Hemû heldestne ser pêyan tenya yekêk nebê.  
Le wî yeke depirsin:  
-Wa diyar e, to hîç le jineket natirsê, bo ye  
helnastîte ser pêyan?  
Kabra delê:  
-Be xwa qaçım birîndar e, çunke emro jinekem  
darêkî baş be qaçima malîwe!!!

# XAÇA SOR A KURD ÇÔ HEBEŞİSTANÊ



serokê heyetê  
Dr. Zikta Leylanî

Xêrxwaz û hevalbendê feqîr û nexwes û belengaz û perîsan û bêçar û tolaz û pêxwasan Xaç a Sor a Kurd li gel Xaç a Sor a Almanî ji bo alîkariya felaketzadeyan bi sê qamyonan çûn Hebeşistanê (Etiyopya).

Serokê heyeta tevlîhev Dr. Zikta LEYLANÎ berî ku bi rê kevin, li Bonn'ê li meydana pişta îstesyonê derket ser qamyonekê û beyanek da. Dr. Zikta Leylanî di beyana xwe de êş û liberketina xwe û di rojêñ wisa de giringiya piştgirîyê dîyar kir.

Barê qamyonan KARTOL (petata), BULXUR, PîVAZ û LEHANE (Kelem) bûn.

ANK'a Mîrkut/Bonn

---

NOT: Te dî dunya ye, ci dibe ci nabe, belkî rojekê adresâ Xaç a Sor a Kurd ji we re lazim bibe, adresâ wê weha ye:

"Li Bonn'ê li pişta îstesyonê kuçeya yekem na, ya duwem, li milê rastê bizivirin heta ku 'Egîtek leqayî we bê, jê bipirsin. BONN/Almanya

# KÎ ÇI ZANE

## BAV ÇAWA YE ?



Yekî derewîn digot:" Kes tuneye ku di ser min re derewan bike!"

Lê, wextekê bihist ku derewîneki jê xerab-tir heye. Dibêje "Wele ezê herim vî merivî bi bînim, hela kanê çawa ye, çawa dikare ji min zêdetir derewan bike.", û bi rê dikeve diçe. Tê ber mala derewîn, li derîyê wan dixe. Lawi-kek dertê ber deri, mîrik dibêje:

- Ma ev der mala filankes e?
- Belê apo, ez kurê wî me, te ci divê?
- Wele qet, hema min got ez bibînim.
- Fermo derbasi hundur be apo.
- Ma qey bavê te ne li malê ye?
- Na apo..
- Eê, kuda çûye?

-Wele li wê taxê tîsek bi 'ewreki ketiye, çûye bi hev ve bidurû, ewê nuka were.:

Mîrik 'ecêbmayî dimîne û ji xwe re dibêje : "Wey xwelî li serê min û bavê min be, hela tu li kurê wî binêre, kî ci zane bavê wî çawa ye?"



## PÊKENÎNEK



Rojekê gundîyek ji Cilîna, ji xwe re bawesîngekê dikire. Lê ji bo ku bawesînga wî kevn nebe, bawesîngê li ba nake, lê serê xwe li ba dike..!

# BANGEK



DIVÊ HAYA HERKESÎ JÊ HEBE, JI VÊ SÛN DE  
EW KESÊN KU BÊ ÇEK Ô SÎLEH BIN DÊ NIKARIBIN  
DI SEV Ô SAHIYÊN KURDAN DE CÎH BIGRIN.

KESÊN KU DIXWAZIN DI SEV Ô SAHIYAN DE  
BESDARBIN Ô CÎH BIGRIN, DIVÊ BI KÊMANÎ DEBAN-  
CEYEK WAN HEBE.

NOT: Di şevan de kesên xwedî keleşînkof dê li  
pêşiyê rûnîn.

Gulle û fîşekên sîlehan jî di şevan de li  
bufe û standan têñ firotin.

## BANGEWAZEK !

Bo xawêni romanî "TO"



Kakî bira,

Şiteket be destman gehîşt. Be rastî ser û binman kird, le mebest û merameket halî nebûyin. Xo nazanîn nawerokekey "ROMAN"it basî ci deka!

Bê qeza bî, hey bê bela bî!

Nawerokekey bo man nedozrawe ke basî ci dekat, ta ku zû wa bangewazîyek bike boewey belkû xelkîtirbi tiwanê yarmetît bidat û nawerokek bo bidozinewe.

Ew kate êmeş be çawan em romane dirêjet le lape-rey "Mêjûy Edebi Kurdîman" da bot çap dekeyn û bee-meş hengawêk edebî kurdîman degeyênite ser qebr !

Lepirsrawî beşî Soraniy  
Govarî Mîrkut

**helbestek ji**  
**Mahmut BAKSI**



**“Eştil beştil Evdilla  
Evdilla çû mala mela  
Evdillê keça melê xwest  
Melê anî serê Evdillê bela..»(.)**

(.) : M. Baksi

Şivan'ın Sevdası, 1984  
rûpel: 98

# her babet xwendevan

Ji vê şûn de, emê her carê di vê rûpelê de wêne(rism)yê her babet, her cûre, her te wir, her çêşit xwendevanan çap bikin. Nuka em sê babet ji xwendevanan li vê derê pêş kêşî we dikan. Ger xwendevanên ku dixwazin rismê wan jî derkeve, divê wêneyekî xweyî reş û sipî bişîne, an jî bila bi nivîsekê tarîfa xwe bike û bila dirf û nîşanên xwe bellî bike wê gavê emê rismê wî çebikin.

Mîrkut

Ji we re sê babet xwendevan:



Xwendevanekî  
Belengaz



Xwendevanekî  
Kezebreş û bêûjdan



Xwendevanekî Rût